SEROKÊ KURDISTANÊ LI BEXDAYE

Bi merema pişikdariyê di avakirina hikumeta Îraqa federal ya nû de serokê herêma Kurdistanê birêz Mesûd Barzanî ber bi Bexdayê ve çû. Li wir serokê Kurdistanê çav bi birêz Celal Talebanî serokê komarê Îraqa federal ket û helwestê lîsta hevpeymanî li ser avakirina hikumeteka demokratîk fere layen dubare kir. Her li Bexdayê lîsta hevpeymaniya Kurdistanê ku li rêza duyê di hilbijartinên borî li 15/12/2005 de hat. Şiyaye bibe sitûna sereke ya li hevkombûna hemû aliyên Îraqê, her ji Sunneyan ku eniya Tewafiq nûneratiya wan dike, ta aliyê Şîe jî ku hevalbendiya Şîiî xwe bi nûnera wan dizane, her di vî warî de pitriya rojan serokên alî û hizbên ku bi serketine serî li baregayê serokê Kurdistanê dixin û her di peyamekê girêdayî vê yekê, rojnameya ALîtihad ya Îmaratî û li 20/2. belev kiribû ku niha hemû aliyên Îraqê wê danûstandinê li ser wê pirojeyê dikin, ku û lîsta hevpeymaniya Kurdistanê amedekirî. Li aliyekî din û ji ber nêzîk bûna destpêka fermî ya danûstandinan ji bo ava kirina hikumeta nû ya Îraqa federal, serokê herêmê ji Bexdadê ji partiyên Kurdistanê xwest ku ew jî li Bexdadê amede bibin ji bû ji nêzîk agehdarî karê li wir tê kirin bibin.

Û li vir gereke were gotin ku ta niha jî danûstandin di navbera lîsteyên sereketî de berdewamin ji bûy avakirina hikumetê û damezirandina civata asayişa netewî ya ku serokên lîstên serketî di xwe de komk dike.

TA SALA 2007Ê
NÊÇÎRVAN BARZANÎ
SEROKÊ HIKUMETA HERÊMA KURDISTANÊ YE

Li gor dengûbasan, û li rojên dawiyê heyva duya, perlemanê Kurdistanê wê ji bo destnîşankirina serok û cêgirêserok û wezîran kom bibe, sebaret vê yekê, Kemal Kerkûkî cêgirê serokê perlemanê Kurdistanê zêdebarî piştra vê nûçeyê, yekser ku li 22/2/2006ê perleman wê rûniştineka ne asayî li darxe ji bo destnîşankirina serokê encumê wezîran û cêgerê wî û serokê hikumetê wê were rasbardin ji bo pêkînan hikumeta Kurdistanê di dema mihekê de, serokê hikumetê kabîna xwe bi cih bîne û li dû wan zanyarên ku ji Yektiya Nîştimanî Kurdistan hatine, Umer Fetah serokê hikumeta Kurdistanê îdareya Silêmaniyê wê posteyê cêgirê serokê hikumetê werbigire. Raspardina Nêçîrvan Barzanî bo pêkînana kabîna 5 an a hikumeta Kurdistanê li pê wê rêkevtnameyê ye ewa li 7 kanûna duyan a îsal di navbera Partî û Yeketî de li Selahdîn hatiye morkirin . li gor wê rêkevtnameyê Nêçîrvan Barzanî wê ta dawiya 2007 li cihê xwe bimîne.

Dibe Hikumeta Tiknoqrat Were Avakirin

Dr. Fuad Mesûm tekes kir ku rewşa niha ya Îraqê tê re derbas dibe bo pêkînana hikumeta tiknoqrat karekî girane ji ber hebûna nakokî û cudahiyên di navbera lîstên serketî de, ajansa nîştimaniya îraqê li ser zarê Mesûmî got: Dibe hikumeta tiknoqrat were avakirin, eger hat û merciyeteka siyasî hebe û listên serkevtî li ser wê hikumê rêk bikevin.

18 ŞUBATÊ FIRANSOYÊ ŞEHÎD LI BÎRA ME DIÎNE

Yek ji simbulên azadiyê û pêkve jiyanê bû, li Kurdistanê, pêşmergeyekî mandûnenas bû, li dawiyê bû qurbanê karên tîroristî û îslamiya siyasî, ev kes yê li 18 şubatê beriya 5 salan li Hewlêra hatiye şehîdkirin Firanso Herîrî ye.

Şehîd Firanso Herîrî kesekî diyarbû, şehrezayek bû, şiyaneke ferelayenî hebû, û bilîmetek bû di warê piraktîkî û tiyorê de, însanekê bi heybet û cemawerî bû di nav bizava partî û bizava rizgarî xwaza Kurdistanê de, şehîd Firanso zilamekî rastgo û xwedan peyameka pîroz a mirovan bû, li dawiyê ev însanê mirov û neteweperês û aştîxwaz bû qurbanê karên tîroristî li 18/2/2001ê, silav li canê te bin Firansoyê herdem sax.

SEROKÊ CEZAÊRÊ DIBE DAXWAZA LÊBORÎNÊ JI KURDAN BIKE

Li 19/2 bi dehan ji çalak û rewşenbîrên kurdan daxwaz ji serokê Cezaîrê Ebdilezîz Botiflîqa kir ku lêborînê ji gelê kurd bixwaze derbarê wê rêkevtina li sala 1975 di navbera Sedam Husên û Mihemed Riza şahê Îranê de li Cezaîrê hatibû morkirin, ku bi sedema rêkevtinê 180 hezar kurd bûne qurbanî û 5000 gund li Kurdistanê hatin xerakirin. Û li wê çaxê Hewarî Bomidyen serokê Cezaîr bû û Botiflîqa wezêrê derve bû, wan herduyan jî destekê dirêj hebû li rêk xistina wê rêkevtnameyê de. Li vir hejiye bibêjin ku 234 ji rewşenbîr û rojnamenûs û siyasetvanên Kurdistanê di gaziya xwe de daxwaz ji Botiflîqa kir ku bibe nenûrê yê heqxwaziyê û peyama aştiyê di navbera gelê Kurdistanê û gelê Cezaîrê de û gelê Îraqê di gel Cezaîrê .

Li 31/1/2006ê 19 sal in li ser şehîdbûna Edrîsê Ciwanemerg

Berî evro bi 19 salan dilê têkoşerê mezin li roja 31/1/1987ê giha karwanê şehîdan, Ev têkoşer e, yek ji wan kesan bû, ê ku canê xwe li nava lepê xwe kirîne, ji bo azadiya gel û rizgarbûna welatê xwe. Ev însanê têkoşer her zû dikeve nava agirê şoreşê û dibe yek ji fakterên serekî yên pêşvebirin û xurtkirina wî agirî ku di peyrewekê serdar û serkirdeyekê jêhatî û bilîmet tê naskirin. Kak Edrîs Barzanî bi baweriyeka mukum û weke serkirdeyekî aza berhingarî erk û rûdanên dijwar yên qada têkoşînê û berxwedanê de bû. Û hevalên din, şehîdî karî xebat û têkoşîna gelê kurd bidomînin û bi kinarê azadî û serbestiyê re bigihînin. Li vira gereke bibêjin ku her ji roja yekan a hilbûnê agirê şoreşa Elûla mezin, Kak Edrîs weku bab û kalên xwe rêça rizgariyê û azadiyê digire û li ser şopa wan dimeşe û çekê pêşmergeyan diêxe milê xwe û dev ji xwandina xwe ber dide.

Kesên nêzîkî kak Edrîs dibêjin ku ev têkoşer e xwedî hinek şiyanan bû ku li cem her kesî tunebûn, dibêjin Edrîs Barzanî him deman wel mirov dikir ku mirov cidî be, guh dida hemû kesan û zû mebesta wan fêm dikir, xwe dikire hevparê nexweşiyên hevalên xwe, û însanên ne durist şîret dikirin.

Li dawiyê ji Edrîs re dibêjin: Wa şahîd, li şûna wan çemên xûnê îro hevalên te rêçnasên rêçika Barzanî û tev gelê kurd wê berê berxwedan û xûna we tam dikin û azad û azadiyê tam dikin.